**Agahiya dêûbavan li ser Bernameya Dibistanên Mafên Zarokan bi zimanekî hêsan**

Guhertin: 23.08.21

Dêûbav û weliyên hêja,

Dibistan ji bo zarokan cihên taybetî ne. Ew li wir fêrî xwendin û nivîsandinê dibin. Û ew ezmûna jiyanê bi dest tînin - hevaltiyê dikin, serketinan û carinan jî bêhêvîbûn diceribînin.

Keç û xort gelek wext li dibistana xwe derbas dikin.

Ji ber vê yekê, girîng e ku zarok li wir demek xweş derbas bikin:

- Divê zarok li dibistanê rihet bin,
- Girîng e ku mezinan guh bidin wan, û
- Divê zarok li dibistanê bên parastin û ewle bin.

Dibistana zarokê we naha dixwaze di van hemîyan de hîn çêtir bibe. Ya ku mamoste û rêveberiya dibistanê biryar dane ev e. UNICEF alîkariya wan dike ku wiya bikin.

Keç an kurê we dê di demek nêz de li ser mafên zarokan li dibistanê bêtir fêr bibe. Van mafên taybetî ji bo hemî keç û xortan in - li Almanya û li seranserê cîhanê. Ew di yek belgeyê de hatine berhevkirin: Peymana Mafên Zarokan a Neteweyên Yekbûyî.

Mezin dê her weha zarokê we li dibistanê teşwîq bikin ku mafên xwe bicîh bîne: Divê ew nerîna xwe bibêje û divê mamoste wê ciddî werbigirin. Divê zarokê/a we di dayîna biryaran de xwedî rol be. Girîng e ku zarok, hevpolên wan û mamoste li hev guhdarî bikin û bi hev re baş tevbigerin. Ev fêrbûnê xweştir û hêsantir dike.

Tu dikarî çi bikî? Ji zarokê xwe li ser mafên zarokan pirsyar bike. Li ser wan bi wî/wê re biaxife. Meselen, vê pirsyarê bike: Tu di derbarê mafên zarokan de çi bihîstiye? An: Bi dîtina te, kîjan maf bi taybetî girîng e?

Hûn dikarin alîkariya dibistana xwe bikin: Ji kerema xwe pirsnameya pêvekirî tijî bikin û bidin dibistana zarokê xwe. SIPAS JI WE RE!



Digel rêz û hurmet
Kirsten Leyendecker
Koordînatora Bernameya Dibistanên Mafên Zarokan
UNICEF Elmanya

**Peymana Mafên Zarokan a Neteweyên Yekbûyî çi ye?**

Ev peyman hemû mafên zarokan diyar dike. Teqrîben hemî welatên cîhanê ew îmze kirine. Bi vî awayî, wan soz dane ku dê piştgiriyê bidin zarokan û mafên wan. Di Peymanê de 54 madde hene. Ew dibêje

- Hemû zarok wekhev in - zayend, esil an rengê çerm ne girîng e.
- Refaha zarokan girîng e. Pêdivî ye ku her keç û xortek li cîhanê bi awayê herî baş ya gengaz were piştgirî kirin.
- Mafê zarokan heye ku baş bijîn û geşe bikin.
- Divê nêrînên zarokan bi ciddî bêne wergirtin.

Pirsên we yên din hene? Ger wisa ye, ji kerema xwe bi vê navnîşana îmeylê bi me re têkilî daynin: kindrech-teschulen@unicef.de.

Ji bo agahiyên bêtir li ser bernameyê, biçin vir: unicef.co.uk/childrens-rights-schools

Ji kerema xwe ve

- pirsnameyê tijî bikin û
- bidin dibistanê

Gellek spas!